

Curcî Zêdan



Yek ji mestirîn romanerê Ereban e

Romanerên ereb ê mezin Curcî Zêdan (Georgî Zeydan), li Beyrûtê (Lubnanê), sala 1861ê ji dayîk bûye, û sala 1914ê koça xwe ya dawî kiriye. Li şûn xwe gelek pirtûkên navdar li ser ol û dûroka Îslamê hêştine. Ew xudanê kovara (El-Hîlal)e, û bi zimanên Erebi, Îngilîzî, Firensî, Suryanî û Îbrî jî dizanî, tevî ku nikanî bû dibistana xwe ya seretayî bê birrîn bibira serî.

Curcî Zêdan bi piranî, hem romanên xwe yê ku 20 lib in, bi piranî li ser dûroka îslamî nivîsandine, û wilo diyar dibe, ku ew haydar û zana bûye di wî warî de. Tevî ku pirtûkên wî gelek belav bûn jî, di nav welatên Ereban de, ew wekî endamekî tevgera cîhanî ya Masonî dihate dîtin, û ji ber wê yekê, li ser wî, bi nedilxweşî dihate peyivîn. Gava ew miriye, nivîskar û hozanvanên erebî Xelîl Metran û Hafêz Îbrahîm helbestên şînî li ser wî hûnandin, Mîrê hozanvanan Ehmed Şewqî jî, yê ku di koka xwe de Kurd e, pesna Curcî Zêdan bi helbestekê aniye zimên.

Curcî Zêdan dev ji dibistanê berda, da harîkariya bavê xwe di kar de bike, hema pişt re di dibistaneke şevî de fêr bû zimanê îngilîzî, û di kolêga Sûrî ya Încîlî de, di zankoya Amerîkî ya Beyrûtê de, xwendina bizîşkiyê kir. Pişt re koç kir Misirê, û li wir di ber xwendina xw re, di sala 1883 de, bû rojnamevan û wergêr di rojnameya (Ezzeman) de, ku xudanê wê mirovekî Ermenî yê bi navê Eliksan Serrafiyân bû. Gava Îngilîzan avêtine ser Sûdanê, ew ji wan re li wir bû wergêrek. Lê wekî rojnamevan bo kovara (Elmuqtetef) jî demekê nivîsand...

Sala 1885 vegeriya Lubnanê, û li wir bû endamê Civangeha Zanyarî ya Rohilatî. Di navbera Misir, Brîtaniya û Lubnanê de çûyîn û hatinên wî çê bûn. Di sala 1892ê de li Misirê kovara (El-Hîlal) a gelek navdare li nav Ereban avakir û di wê de pirtûkên xwe yek û yek, birr bi birr, belav kirin.

Cucî Zêdan Pirtûkên xwe yê dûrokî li ser Misira Osmanî, şaristaniya îslamî, dûroka Misira nûjen, dûroka Ereban berî Îslamê, li ser dûroka Masoniyê, li ser gera xwe ya li Ewrûpa nivîsandine, bi ser de jî li ser dûroka Brîtaniya, Girîk û Romanan, û li ser wêje û ziman û êlên erebî yê kevnare, li ser felsefeya zimanî û bêjeyên erebî, nivîsandiye...Divê em ji bîr nekin, ku li ser Avahî û felsefeya nûjeniya şaristaniyê jî nivîsandiye...Ji van pirtûkan jî hene 1-4 cild in...

Ji romanên Curcî Zêdan: Keça Ghassan, Armanûsa, Elhecac kurê Yûsif, Vekirina Andelusiya, Şarl û Ebdirehman, Ebo Muslim, Xanima Misirî, Bakireya Qureys, 17ê Remezanê, Ele'bbasse xûşka Erreşîd, bûka Ferxane, Ahmed kurê Tolon, Ebdirrehman Ennasêr, Serbinkirina Osmanî, Selahdîn, Memlokê verêbûyî, Zorbaziya Memalîkan, Cîhada Hezkirîyan, Şeceruddur û Destegîrê Mutemehhîdî...Wekî em dibînin, wî li ser dûroka berî Îslamê, ya dema Umewwîyan, ya Ebbasiyan, ya Eyûbîyan, Memalîk û Osmanîyan nivîsandiye, li ser dema Ereban li Andelus jî...

Ew berî mirina xwe çûbû Filistînê jî, û li ser tevgera Zayûnî nivîsandibû...

Cucî Zêdan wekî mirovekî fileh, bi nivîs û romanên xwe, bi xebat û kefteleftên xwe yê lêkolînî û rojnamevanî, di navbera Fileh, Cih û Musilmanan de piryeke pan û bilind û bi hêz, û pir giring ava kir.